**Sîlabus/Bername**

**Aştiya Rexneyî û Civaka Sivîl**

**Dr. Ferda Fahrioğlu**

**Kengî & Li Ku:   14.04.2026-14.07.2026**

**Mêvandar: Zanîngeha Humboldt bi Sertîfîkaya 4 ECTS* Zanîngeha Rojava**

***Çawa hûn dikarin qursa xwe ya li Zanîngeha Off ji bo krediyê bihesibînin?**

Qedandina serkeftî ya qurseke li Zanîngeha Off ji aliyê zanîngeha mêvandar ve tê pejirandin.

Ev tê wê wateyê ku hûn dikarin van krediyan li her zanîngeheke di nav EHEAyê de di bernameyeke ku hûn tê de qeydkirî ne de bi kar bînin, an jî hûn dikarin vê yekê wekî zanîna berê di bernameyeke xwendinê ya pêşerojê de bihesibînin. Ji bo ku hûn piştrast bibin ku hûn dikarin krediyan veguhezînin, em pêşniyar dikin ku hûn ji ofîsa xwendekaran a zanîngeha xwe ya malê piştrastkirineke nivîskî werbigirin. Û heke hûn di tu bernameyeke zanîngehê de ne qeydkirî ne: Hûn bi dil û can bi xêr hatine ku beşdar bibin!

Hemû qursên me bêpere ne û ji bo her kesî vekirî ne: xwendekar, zanyar, çalakvan.

**Danasîn:**

Laboratuwara serhêl a "Aştiya Rexneyî û Civaka Sivîl" rola civaka sivîl wekî aktorek navendî ya asta navîn di pêvajoyên avakirina aştiyê de vedikole, û xwe dispêre çarçoveya bingehîn a John Paul Lederach û xebata wî ya bi bandor a bi navê Avakirina Aştiyê: Lihevhatina Berdewam di Civakên Parçebûyî de (1997). Li ser bingeha modela sê-alî ya Lederach a serokatiya avakirina aştiyê—asta jorîn, asta navîn û asta bingehîn—kurs bi taybetî balê dikişîne ser aktorên asta navîn, di nav de rêxistinên civaka sivîl (RCS),

rêberên olî û etnîkî, rewşenbîr û komeleyên pîşeyî, û şiyana wan a ji bo avakirina pirê di navbera biryarder û civakên ku ji pevçûnê bandor bûne de.

Kurs bi nîqaşên sereke yên di teoriya aştiyê ya rexneyî de derbarê rolên normatîf û pratîkî yên civaka sivîl di civakên dabeşkirî de re mijûl dibe. Giringiyeke taybet tê dayîn ser karên civaka sivîl ên ku ji hêla Thania Paffenholz û Christoph Spurk (2006) ve hatine destnîşankirin—parastin, çavdêrî û berpirsiyarî, parêzvanî, civakîkirina ji bo aştiyê, hevgirtina civakî, navbeynkarî û hêsankirin, û pêşkêşkirina xizmetan—û ka ev kar di çarçoveyên pevçûnên demdirêj de çawa dixebitin. Bi rêya kombînasyona xwendinên teorîk û analîzên li ser bingeha bûyeran, xwendekar dê hem potansiyela veguherîner û hem jî sînordariyên destwerdanên civaka sivîl bi awayekî rexneyî binirxînin.

Ev qurs, ku wek semînereke înteraktîf hatiye avakirin, wêjeya akademîk bi zanîna serpêhatî re dike yek. Nûnerên rêxistinên civaka sivîl, di nav de rêxistinên endamên Tora Aştiya Rexneyî, û komên ku di warên mafên mirovan, mafên jinan, parêzvaniya LGBTQI+, mîrateya çandî, bîranîn û perwerdehiyê de dixebitin, dê wek axaftvanên mêvan beşdar bibin.

Kurs giraniyeke taybet dide ser însiyatîfên avakirina aştiyê yên têkildarî pirsa Kurdî li Tirkiye û Sûriyê, bi beşdariya pispor û xwendekarên ji Zanîngeha Rojava, yên ku dê serpêhatiyên xwe yên qadê yên ji xebatên civaka sivîl ên di bin şert û mercên dijwar de parve bikin. Her hefte, nûnerê rêxistineke civaka sivîl a ku li ser mijara têkildar dixebite dê serpêhatiyên xwe parve bike. Piştî wê, xwendekarên ji Zanîngeha Rojava dê li ser însiyatîfên civaka sivîl ên bi heman rengî li Rojava pêşkêşiyan bikin û dê nîqaşeke berawirdî were kirin.

Xwendekar dê beşdarî nîqaşên tematîk ên heftane, diyalogên bi pisporan re û analîzên lêkolînên rewşê bibin. Pêdiviyên qursê beşdariya çalak û raporek lêkolînê ya ku rêxistineke civaka sivîl a ku di warê pêwendîdar bi aştiyê re li Sûriyê dixebite, vedikole, di nav xwe de dihewîne. Qurs, ku ji bo peydakirina hawîrdoreke ewle ji bo hemû beşdaran hatiye sêwirandin, armanc dike ku ramana rexneyî, analîza berawirdî û têgihiştina hestiyar a li gorî çarçoveyê ya li ser rola civaka sivîl a ku di pêvajoyên avakirina aştiya domdar de diguhere, pêş bixe.

**Xwe-parastina Dîjîtal**

Platforma me ji bo belavkirina zanîna ku ji aliyê rejîmên otorîter û populîstên rastgir ve di bin xeterê de ye, û ji bo danîna tedbîrên ku mirovan şareza bikin da ku xwe-parastina dîjîtal bikin, hatiye veqetandin.

Em hemû bikarhêneran teşwîq dikin ku bi awayekî nenas li ser platformê qeyd bibin û rêzê li tercîha kesên din a ji bo nenasmanê bigirin. Ji kerema xwe, kesî neçar nekin ku agahiyên xwe yên şexsî parve bike an jî bêyî ku ew agahdar bin wêneyên ekranê (screenshot) yên kesên din nekişînin.

Ders li ser Moodle a Off University'yê tên lidarxistin. Platform vebijarka banga vîdyoyê ya şîfrekirî, depoyek ewrî, û her weha sîstemeke peyaman dihewîne. Em dixwazin bînin bîra hemû bikarhêneran ku pêwendiya bi bikarhênerên din re li derveyî platformê (ango e-name, Instagram, Facebook, Whatsapp an amûrên din ên konferansa vîdyoyê) dibe ku wan bixe xeterê.

**Encamên Fêrbûnê**

1. Têgihiştineke berfireh a têgeha "Aştiya Rexneyî".

2. Pêşgotinek li ser ramana navdîsîplînî ku warên zanista siyasî, lêkolînên aştiyê û pevçûnê, û sosyolojiyê di nav xwe de digire..

3. Vekolîna bûyerên li herêmên pevçûnê ji perspektîfa aştiyê û çareserkirina pevçûnê.

4. Pêşxistina jêhatîbûnên argumanî û nîqaşê bi mebesta beşdarbûna di nîqaşên li ser bingeha delîlan.

5. Guhdarîkirin û kirina analîza berawirdî ya serpêhatiyên meydanê ji nûnerên civaka sivîl ên li Tirkiye û Sûriyê.

**Metodolojî ev tiştan li xwe digire:**

1. Ders û Semîner,

2. Xwendin,

3. Nîqaş,

4. Lêkolîna bûyeran,

5. Amadekirina pêşkêşiyan

6. Nivîsandina gotareke lêkolînê

7. Endamên Tora Aştiya Rexneyî a li Tirkiyeyê wek mêvan beşdarî dersê dibin û serpêhatiyên xwe parve dikin.

**Notê dawî yê qursê dê li ser bingeha van xalan be:**

Notê dawî yê qursê dê li gorî van pîvanan were diyarkirin:

*Beşdarbûna çalak û tevlêbûna di nîqaşan de %20 tê pîvandin.

* Nirxandina dawî dê ji %40 tevkariya pêşkêşiyeke slaydan a 15-deqeyî pêk were, ku dê li pey wê danişîneke pirs û bersivan a 5-deqeyî hebe. Ji beşdaran tê xwestin ku lêkolîneke akademîk li ser rêxistineke civaka sivîl a li ser bingeha mafên mirovan amade bikin.

*Karên nivîskî (%40): Analîza Lêkolîna Mînak. Divê hemû karên nivîskî resen bin, bi awayekî rast hatibin çavkanîkirin, û li gorî standardên durustiya akademîk bin.

**Organîzasyona qursê**

| Hefte | Mijar | Mêvan |
|---|---|---|
| **Hefteya 1 14.04.2026** | Pêşgotin ji bo rola civaka sivîl di avakirina aştiyê de | |
| **Hefteya 2 21.04.2026** | Tecrûbeya Tora Aştiyê ya Rexneyî | Hevgirtina Navneteweyî |
| **Hefteya 3 28.04.2026** | Aştî, Mafên Mirovan û Dadweriya Veguherînê | Komeleya Mafên Mirovan (İHD) |
| **Hefteya 4 05.05.2026** | Aştî û Hiqûq I | Weqfa Lêkolînên Civakî û Hiqûqî (TOHAV) |
| **Hefteya 5 12.05.2026** | Aştî û Hiqûq II | -Komeleya Parêzeran a ji bo Azadiyê (ÖHD |
| **Hefteya 6 19.05.2026** | Aştî û Mîrateya Çandî | Komeleya Diyarbekirê ya Parastina Sermiyanên Çandî û Xwezayî (DKVD) |
| **Hefteya 7 26.05.2026** | Aştî û Zayend I | -Komeleya Jinan a Rosa<br>-Komeleya Dema Jinan |

off university

| | | |
|---|---|---|
| **Hefteya 8 02.06.2026** | Aştî û Zayend II | -Înîsiyatîfa LGBTI+ ya ji bo Aştiyê (BİLGBTİ+) |
| **Hefteya 9 09.06.2026** | Aştî û Bîranîn I | Navenda Bîranînê |
| **Hefteya 10 16.06.2026** | Aştî û Bîranîn II | -Komeleya Lêkolînên Bîranîna Romanan (Romani Godi) |
| **Hefteya 11 23.06.2026** | Aştî û Perwerdehî | -Enstîtuya BÎRARADA<br>- OFF University |
| **Hefteya 12 30.06.2026** | Rojnamevaniya Aştiyê | |
| **Hefteya 13 07.07.2026** | Çanda Aştiyê | Komeleya Lêkolînên Ziman û Çandên Mezopotamyayê |
| **Hefteya 14 14.07.2024** | Nirxandin û Bertekan | |